

Bêcih û Bêwar: Di Berhemên Fawaz Husên de Wuslat û
Fîraq

Mehmet Şirin Filiz¹

Yersiz Yurtsuz: Fawaz Husên'in Eserlerinde Fîraq ve Wuslat

Öz

Fîraq ve wuslat antikiteden günümüze edebiyatta sıklıkla işlenen konulardır. Bu konular bir şeyden ayrılış ve bu şeye karşı duyulan özlem şeklinde edebiyatta görülür. Bu şey sevgili ya da vatan olabilir. Bu çerçevede vatandan ayrılış ve vatana duyulan özlem fîraq ve wuslatın bir türüdür. Bu tür anlatılarda kahramanın farklı nedenlerden ötürü vatanından ayrılmak zorunda kalması ve ülkesine geri dönerek wuslata ermesi şeklinde edebiyatta görülmektedir. Bu konular daha çok diaspora edebiyatında görülür. Göçmen edebiyatı olarak ta bilinen bu edebiyatta göçmenlerin yeni ulaştıkları kentlerde karşılaştıkları sorunlar ile anavatanlarına duydukları özlem ve geri dönme arzusu ana konulardır. Benzer konular Kürt diaspora edebiyatında da görülebilir. Avrupa'ya göç eden Kürtler burada önemli bir kürt diaspora yazar çevresi oluşturdular. Bu çerçevede kırk yılı aşkın bir süredir Pariste yaşayan Fawaz Husên fîraq ve wuslat konularını eserlerinde en çok işleyen yazarlardan biridir. Bu nedenle bu çalışma onun anlatı dünyasında fîraq ve wuslatın nasıl işlendiğini göstermeyi amaçlamaktadır. Bu çerçevede, bu çalışmada onun roman ve öyküleri incelenmiştir. Sonuç olarak görülmüştür ki onun anlatı dünyasının merkezinde doğduğu şehir olan Amûdê ile sürgünde yaşadığı şehir Paris bulunmaktadır. Amûdê çocukluğunun, yarım kalmış düşlerinin şehriyken Paris ise yabancılaşmanın ve melankolinin şehridir. Karakterleri de bu iki şehir arasında yersiz yurtsuz bırakılmış ve birgün wuslata erme umudu ile yaşayan karakterlerdir.

Anahtar Kelimeler: Fîraq, Wuslat, Göç, Yabancılaşma, Melankoli, Fawaz Husên.

¹ Dr. Öğr. Üyesi, Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, mehmetsirinfiliz@gmail.com, ORCID: [0000-0003-0622-5510](https://orcid.org/0000-0003-0622-5510).

Homeless: Firaq and Wuslat (Seperation and Meeting) in the Works of Fawaz Husên

Abstract

Firaq and Wuslat (Seperation and Meeting) are common subjects in literature from antiquity to the present day. These subjects take the form of separation from something and longing for it. This can be a lover or a homeland. In this context, leaving from and longing for the homeland is also a form of firaq and wuslat. In such narratives, the protagonist's leaving from his homeland for various reasons and his return to his homeland are main subjects. These subjects are mostly seen in Kurdish diaspora literature. In this literature, also known as immigrant literature, the main themes are the problems faced by immigrants in the cities they have recently arrived in, and the longing they feel for their homeland and the desire to return. Within this framework, similar themes can also be seen in diaspora literature. Kurds who migrated to Europe formed an important circle of Kurdish writers. Fawaz Husên, who has been living in Paris for more than forty years is one of the most prominent writers in this context, dealing with the themes of firaq and wuslat in his works. Therefore, this study aims to show how the subjects are treated in his narrative world. In this framework, his novels and short stories were analyzed. As a result, it is seen that Amûdê, the city of his birth, and Paris, where he lived in exile, are at the center of his literary world. While Amûdê is the city of his childhood and unfinished dreams, Paris is the city of alienation and melancholy. His characters are also displaced between these two cities and live with the hope of one day reaching a final resting place.

Keywords: Firaq, Wuslat (Seperation and Meeting), Migration, Alienation, Melancholy, Fawaz Husên.

Bêcîh û Bêwar: Di Berhemên Fawaz Husên de Wuslat û Fîraq

Kurte

Fîraq û wuslat ji demên kevnare heya serdema me gelek caran bûne mijara edebiyatê. Ev mijar wekî ji veqetîna tiştekî û bêrîkirina wî di edebiyatê de cih digrin. Ev tişt dikare bibe maşûq an jî welat. Di nav vê çarçoveyê de veqetîn û bêrîkirina welat jî cureyê wuslat û fîraqê ye. Di vegêranên bi vî rengî de lehengek ji ber sedemên cuda mecbûr dimîne ku ji welatê xwe derkeve û paşê jî vedigere welatê xwe anku digihîje wuslatê. Ev mijar bêtir di edebiyata dîasporayê de têne dîtin. Di vê edebiyatê de ku wekî edebiyata penaberan jî tê dîzaniyê problemên penaberan ku ew li xeribiyê rûbirû mane û hesret û vegera welat mijarên sereke ne. Mijarên bi vî rengî di edebiyata kurdî ya dîasporayê de jî têne dîtin. Kurdên ku gihaştin Ewropayê li vir derdorekî giring ya nivîskarên dîasporayê ava kirin. Fawaz Husênê ku ev jî zêdetirê çil salî ye li Parîsê dijî, wekî nivîskarekî dîasporîk yek ji wan nivîskaran e ku herî zêde van mijaran di edebiyata xwe de bi kar aniyê. Ji ber vê sedemê ev xebat

dil dike ku destnîşan bike ka gelo di cîhana wî ya edebî de wuslat û fîraq çawa reng vedane. Di nav vê çarçoveyê de di vê xebatê de, kurteçîrok û romanên wî hatine analîzkirin. Di encamê de hatiye dîtin ku di navenda cîhana wî ya edebî de bajarê Amûdê ku ew lê ji dayik bûye û bajarê Parîsê hene ku ew li wir di sirgûnê de dijî. Amûdê bajarê wî yê zarokatiyê û xewn û xeyalên nîvcomayî ye û Parîs jî bajarê biyanîbûn û melankoliyê ye. Karakterên wî jî di navbera van herdu bajaran de bê cih û bê war mane û bi wê hêviyê dijîn ku rojekê vegerin welatê xwe anku bigihijên wuslatê dijîn.

Peyvên Sereke: Fîraq, Wuslat, Koçberî, Biyanîbûn, Melankolî, Fawaz Husên.

Extended Abstract

Fîraq means separation from a person, thing, or object that is longed for, and wuslat eans the end of longing. These concepts have been the subject of different branches of literature. In love narratives, they are mostly seen in the form of separation from and reunion with the beloved, while in religious narratives they take on a mystical appearance and take the form of reunion with God. However, from mythological narratives to modern narratives, wuslat and fîraq are also seen in many narratives in the form of leaving and returning to the homeland. The first known example of this is the *Odyssey*. In this epic, Odysseus' forced leaving from his homeland Ithaca, and the troubles he suffered while returning to his homeland constitute the center of the narrative. From Odysseus to the present day, the themes of migration and return have been covered in literature because the phenomenon of migration continues to be at the center of many political and social problems in the world. In the age we live in, millions of people from different geographies of the world leave their homelands and migrate in search of a better life. These migrant communities create their own artistic and cultural works by forming diaspora communities in the new countries they reach. Within this framework, Kurdish society has also been experiencing the phenomenon of migration for many years. Kurds have been migrating en masse to different parts of the world, especially to European countries, for various reasons, including political, social and economic reasons. Germany, Sweden and France are among these countries. Kurds who migrate to these countries produce their own cultural and artistic works thanks to the opportunities they have gained in these countries. For this reason, we can say that there is a strong Kurdish diaspora literature produced in these countries. One of the most important topics of Kurdish diaspora literature is the problems faced by immigrants in their homeland and the problems they face in which they have recently arrived. However, it can be said that not every country has a negative image in Kurdish diaspora literature. For example, Sweden has a more positive image in Kurdish diaspora literature because the Kurds living there have better opportunities due to Sweden's immigration policies. France, on the other hand, is not a country that offers good opportunities for immigrant communities. In this country, immigrants, including Kurds, have to live under more difficult conditions than in other European countries. Especially cities like Paris are cities of alienation, poverty and melancholy for immigrants. In this context, as a diasporic writer who has been living in the

diaspora for more than forty years, Fawaz Husên has deeply experienced the immigration situation. The main subjects of his works are the problems in his homeland and the problems faced by immigrants in Paris, where he lived as an exile. In this context, this study aims to analyze Husên's works within the framework of wuslat and firaq and to show how the themes of leaving and return are treated in relation to these concepts. Within the scope of the study, Husên's novels and short stories written in Kurdish were analyzed. As a result, it was seen that the city of Amudê, which he was forced to leave, and the city of Paris, where he was forced to live as an exile, are at the center of Husên's works. While Amûdê symbolizes the unfinished dreams of his childhood despite all its negativities, Paris symbolizes alienation for immigrants. Therefore, at the center of Husên's works is the state of being caught between two worlds. The psychological worlds of his characters are also shaped by this in-betweenness. They belong to both worlds and nowhere.

Destpêk

Fîraq û wuslat û di edebiyatê de bi awayên cuda hatine bikaranîn. Carinan ev herdu têgeh fîraq û wuslata di navbera evîndaran carinan jî wekî ku di edebiyata klasîk de tê dîtin di nav çarçoveyê de ofî de têne bikaranîn. Lê ev her du tema bêhtir bi sirgûn û vegera welêt re eleqedar in ku em van di gelek metnên kevnare de jî dibînin.² Ligel vê yekê sirgûn û penaberî hêj jî parçeyê jiyana mirovên modern in, lewra ji ber rêveberiyên totalîter, îdeolojiyên fundemantalîst bi milyonan însan mecbur dimînin ku ji welatê xwe derkevin. Ji ber vê yekê ye ku ev problem di heman demê de, di edebiyatê de jî gelek caran hatiye bikaranîn. Her çend ev wekî tiştê xerab bê dîtin jî ev yek rê dide ku nivîskarên baş di nav cîhana edebiyatê de derkevin holê (D'addario, 2007: 3). Bo nimûne, li gorî Said (2016: 396) sirgûnbûn ji bo edebiyatê derfetên nû çêdike. Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare behsa kesên wekî Sappho, Dante, Comenius, Zola, Mann, Joyce, Beckett bike. Heta îdîa dike ku edebiyata rojava ji aliyên kesên sirgûn an jî kesên ku li ser sirgûnê ve nivîsine hatiye afirandin. Bo nimûne Beckett, Nabokov, Pound kesên bi vî rengî ne (Said, 2006: 29).

Wekî ku Said jî îdîa dike mirov bi hêsanî dikare bibêje ku di nav edebiyata Ewropayê de sirgûn roleke sereke lîstiyê. Ji ber ku gelek nivîskar ji ber sedemên cuda bê cih û bê war mabûn û vê rewşa wan tesir li ser edebiyata wan jî dikir. Ev yek belkî herî zêde di nav edebiyata cihûyan de tê dîtin. Lewra dîroka cihûyan jî serdemên kevnare heya serdema modern bi sirgûnê re têkildar e (Volkova, 2021: 11-12). Sirgûn dema ku ne şexsî lê bi girseyî be di encama vê yekê de civakên diasporîk derdikevin holê. Ji ber vê yekê ye ku vegêranên li ser sirgûn û vegere herî zêde di nav civaka cihûyan de têne dîtin ku em van yekan di metnên modern ên cihûyan de jî dibînin. Lewra dîroka wan ya sirgûniyê di heman demê de hişmendiya wan jî ava kiriye. Bo nimûne wekî nivîskarekî modern di berhemên Agnon de ev tema gelek caran xwe didin der ji ber ku Agnon bi xwe jî mirovek sirgûnî bû û mecbûr mabû ku di gelek welatên cuda de bijî. Ev jî bibû sedem ku sirgûn û vegere bibin temayên sereke di berhemên wî de (Hoffman, 1991). Lê ne tenê di vegaranên cihûyan de, di heman demê de di gelek civakên diasporîk yên wekî ermen û yewnan de jî em temayên sirgûn û vegere dibînin.

Heger em di nav vê çarçoveyê de behsa kurdan bikin, mirov dikare bibêje ku ev demeke dirêj e ku kurd jî ber sedemên cuda dev ji welatê xwe berdidin û bi taybetî jî ber bi Ewropayê ve koç dikin. Ev yek jî bû sedem ku diasporayê kurdan li Ewropayê derkeve hole. Heya sala 1970yî sedemên koça kurdan ji sedemên siyasî bêhtir ji ber rewşa aborî bû. Lê piştî van salan sedemên koçberiyê guherîn. Lewra ji ber şer û pevçûnan û koçberkirina bi darê zorê, kurd bi girseyî berê xwe dan

² Bo nimûne metna herî kevnare ya di derbarê sirgûnê de pirtûka Sinûhe ye. Sinûhe dema ku Qralê îxtiyar ê Misrê dimire dikeve nav fikaran û derdikeve rêwitiyê dirêj. Ew li Filistinê bi cih dibe lê bi borandina demê rebêriya welatê xwe dike. Dema ku tê fêmkirin tu gunehê wî di kuştina qral de tune ye destûr tê dayîn da ku vegere welatê xwe. Di vê pirtûkê de, Sinûhe behsa çîroka xwe ya sirgûnê dike. (D'addario, 2007: 3).

Ewropayê. Ji ber vê yekê ye ku dîasporaya kurdan beyî fêmkirina rûdanên ku li rojhilata navîn diqewimin nayên fêmkirin (Wahlbeck, 2019: 5). Lê heger em werin li ser nîfşên ewilîn ên ku berê xwe dane Ewropayê, mirov dikare bibêje ku ew ne nîfşên polîtîk bûn. Wekî ku Bruinnessen (1998: 8-9) jî diyar dike ev nîfşên ewilîn bêtir karker bûn û pir têkilî sîyasetê nedibûn, lê piştî salên 1980yî ji ber darbeya leşkerî ya li Tirkiyeyê gelek kesên polîtîzekerî berê xwe dan Ewropayê. Ev jî bû sedem ku kurdên li Ewropayê dijin li nasnameya xwe ya etnîk varqilin. Bi taybetî jî li Swedê mobilîzasyona civaka kurdan gelek zêde bû. Ev der jî bo nivîskar, rojnameger û rewşenbîrên kurdan bû stargehek. Dîasporaya ku li Ewropayê ava bû, di heman demê bû sedem ku jî kurdên vê derê, ji aliye edebî û çandî ve pêş bikevin. Erê ew penaber bûn lê wan tu carî têkiliya xwe ji welêt nebiribûn. Lewra wekî Sheffer (2003: 9-10) jî diyar dike civakên dîasporîk civakên etno-netewî ne. Ev civak her çend bi darê zorê an jî bi daxwaza xwe ji welatê xwe hatibin derxistin jî civakên sosyopolîtîk in. Ew tu carî peywendiya xwe bi welatê xwe re qut nakin û bi netewa xwe re di nav hevalbendiyekê de hewl didin ku nasnameyek hevpar ava bikin. Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku dîasporaya kurdan jî dîasporayeye etno-netewî ye. Ew bêhtir bi welatê xwe re eleqedar in û têkiliya wan bi welatên wan tu carî qut nebûye (Wahlbeck, 2002: 225). Li gor Wahlbeck (2002: 232) taybetmendiyên diasporîk yên civaka kurdan ev in: Ew derbarê welatê xwe de xwedîyê hafizayeye kolektîv in, ji hêla ewropîyan biçûkditîna wan dibe sedem ku ew bibin biyanî û ji ber vê yekê ye ku ew her dem bi wê hêviyê dijin ku rojekê vegerin welêt.

Ev xalên ku Wahlbeck diyar dike, di heman demê de, di metnên edebî yên ku dîasporayê de hatine afirandin de jî bi awayeke aşkera têne dîtin. Her çend ev xal, di nav metnên nivîskarên wekî Ferhad Pîrbal, Helîm Yûsiv û Firat Cewerî de werin dîtin jî, ev taybetmendiyên ku Wahlbeck behs dike herî zêde di berhemên Fawaz Husên de peyda dibe. Lewra ew jî 40 salî zêdetir e ku li Fransayê diji û rewşa wî ya penaberiyê bandor li edebiyata wî jî kiriye. Di cîhana wî ya edebî de êşa koçberiyê û hesreta bo welat temayên sereke ne ku ev yek wekî ku li jor jî hate diyarkirin taybetmendiyên vegêranên dîasporîk in. Di vê çarçoveyê de ew xebat di dîke ku ka gelo di kurteçîrok û romanên Fawaz Hûsên de “fîraq” û “wuslat” bi gotinek din “sîrgûn” û “veger” çawa xwe nîşan didin.³ Ji bo vê yekê jî analîzên navxweyî tenê têrê nakin di heman demê de hewce dike ku mirov analîzeke sosyopolîtîk jî bike. Heger mirov ji aliyê sosyolojiya edebiyatê ve binêre wekî ku Sapiro (2019: 97- 98) jî nîqaş dike, edebiyata perîferîk a ku edebiyata penaberan jî di nav vê edebiyatê de ye, gelek caran li Fransayê bûye mijara analîzên edebî. Her

³ Di vê xebatê de tene berhemên wî yên ku bi kurdî hatine nivîsandin esas hate girtin. Ji bilî berhemên wî yên kurdî hatine nivîsandin berhemeke wî ku hatiye wergerandin bi navê “Qûma Mezopotamya” jî heye. Ev roman pêşî bi frensî bi sere navê “*Les Sables de Mesopotamie*” hatiye nivîsandin. Paşê jî dîsa ji aliyê Husên ve hatiye wergerandin û bi sernavê “*Pîçek Jiyan Qetek Asiman*” ji hêla weşanxaneyê Avestayê hatiye weşandin û paşê jî heman pirtûkê ve carê jî bi serenava “*Qûma Mezopotamya*” ji hêla weşanxaneyê Ayrıntı hatiye weşandin. Bi awayekê balkeş di Qûma Mezopotamyayê de hatiye destnîşankirin ev pirtûk werger e lê di “*Pîçek Jiyan Qetek Asiman*” de ibareyek bi vî rengî tuneye. Ji ber vê jî di vê xebatê “*Pîçek Jiyan Qetek Asiman*” esas hate girtin.

çend analizên bi vî rengî bêtir berê xwe didin metnê û analizên navxweyî bin jî xwendineke sosyopolîtîk jî di nav van xebatan de tê dîtin. Lewra serpehatiyên penaberiyê di metnên nivîskarên efrîqî de yên wekî Camara Laye, Cheikh Hamidou Kane û Ousmane Soce, bi awayekî taybet têne dîtin. Ji ber vê yekê di vê xebatê de em ê tenê analizên navxweyî nekin, di heman demê de em ê hewl bidin paşxaneyê sosyopolîtîk a metnên Hûsên jî derxin holê. Lewma jî divê pêşî di berhemên wî de welat çawa hatiye teswîrkirin bê destnîşankirin çimkî di berhemên wî de her çend hesret û vegera welat xalên sereke bin jî di heman demê de rûdanên ku li welat diqewimin sedemên sirgûniya wî jî ne.

Welat Xeyalên Nîvcomayî

Sirgûn her çend were wateya derketina ji welêt jî carinan mirov dikare li welatê xwe jî sirgûn be. Bo nimûne D'addario (2007: 20) diyar dike ku sirgûna navxweyî (interior exile) jî heye. Sirgûna navxweyî tê wateya ku mirov li welatê xwe jî dikare bibê sirgûn. Ev yek cara yekem ji bo wan kesan hatiye bikaranîn ku mixalîfên Hîtler bûn lê dîsa jî mecbur mabûn ku di bin rêveberiya wî de bijîn. Em heman tiştî dikarin ji bo rewşa kurdan jî bibêjin. Lewra Kurd jî li welatê xwe di bin desthilatdariya rejîmên totalîter ên wekî Baas de mecbûr diman ku bijîn. Ji ber vê sedemê ye ku di navbera kurdên ku li dîasporayê dijîn îmajeke neyînî ya welat heye. Welat ji bo wan tê wateya girtin kuştin û talanê. Bo nimûne Wahlbeck (2019: 2) diyar dike ku di hişmendiya kurdên dîasporayê de welat gelek caran cihê trawmayên kolektîv ên dîrokî ye. Ev rabêj di heman demê de dibe sedema mobilîzasyona polîtîk a tevgera kurdan jî ku ev yek ji bo fêmkirina dîasporaya kurdan jî amûreke baş e. Bi heman awayî li gor Khayatî (2008: 158) jî di navbera kurdên serhedê yên ku li Fransayê dijîn de di derbarê welat de îmajeke neyînî heye. Welat ji bo wan tê wateya îşkence, koçberî, rewşa awarte, asîmîlasyon, hovîtî, berxwedan û xeribîyê. Ji ber van rûdanan ew mecbûr mane ku dev ji welatê xwe berdin û berê xwe bidin welatê xeribiyê (Khayati, 2008: 3). Ev yek ji bo civakên diasporîk tiştên hevpar in. Bo nimûne di hişmendiya Dîasporaya filistîniyan de welatê wan bûye mêtîngeh û ev yek dihat wateya bêmilîk hiştin û înkarkirina dîrok û zimanê wan (Eagleton, Jameson û Said, 1993: 13). Ji ber vê yekê ye ku li gor Said (2009: 210-212) filistînî bêcih û bêwar hatine hiştinê ew neteweyeke bênasname bûn û ew jî xwe wekî parazvanekî filistîniyên bênasname didît û li gor wî rola rewşenbîr divê nûnerê milletên bindest bûna.

Sirgûn her çend bi giştî parçeyê vegêranên diasporîk be jî di romana kurdî de di romanên ku li welat hatine nivîsandin jî xwe dide der. Bo nimûne Pariltî û Galîp (2010: 180) diyar dikin ku di romanên nivîskarên ku ji welat dinivîsin de jî sirgûn mijareke sereke ye. Lê di yên ku li welat hatine nivîsandin de îmajeke erenî ya welat heye. Bi gotinek din welat hatiye îdealîzekirin lê di yên diasporayê hatine nivîsandin de welat bi awayeke objektîf hatiye teswîr kirin, ew ne cihekî îdealîzekîrî ye. Gund û bajar ji nasnameya xwe ya siyasî bêtir bi nasnameya xwe ya çandî derdikevin pêş, karakter ji kesên siyasî bêtir kesên ji rêzê ne. Em van yekan di cîhana edebî ya Husên de jî dibînin. Welat di berhemên wî de nehatiye îdealîzekirin

lewra îmajake erenî ya welat tuneye û karakterên wî jî kesên ji rêzê ne. Ew bê cih û bê war in, navê welatê wan li ser nexşeyên cîhanê tuneye, bê nasname ne. Bo nimûne Di Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê de Evdo welatê xwe bi vî awayî teswîr dike: “Her çend welatê min li ser nexşeya xwiya nebe jî ez dibêjim “Bijî Kurdîstan û Yewnanistan dergûşa Îlyada û Odîseyê û hemû xewnên rewan!” (Husên, 2013: 70). Evdo dema ku diçe Laponyayê ji samiyên re behsa welatê xwe dike û dibêje, Kurdistan xwedî zozanên xweşik e, koçer penêr, nivîşk û mastên xweşik çêdikin lê mixabin li welatê wî kesên wekî Seddam hene ku ev welatî kavi kirine (13). Evdo jî welatê xwe bi darê zorê hatiye derxistin. Lewra li gor wî welatê kurdan cihê dagirkeriyê, dîroka talanên bêserî û bêdawî ye. Herkes tê hema çî dikeve ber destê wî ji xwe re dibe û dike malê xwe. Em di sedsala 21mîn de ne, lê ne welat ji me re heye ne jî cihê ewle ku em bikaribin gencîneyên xwe veşêrin. Em ji axa bav û kalan koç dikin û mecbûr dimînin ku li welatê xelkê bibin parsek. Em kurd di destê hêzên biçûk û mezin de dibin pêlîstok. Em tenê doza mafê xwe yê însanî dikin. Li rojhilata navîn li gor dîtina serdestan kurdekî baş kurdekî mirî ye. Kêfa tu kesî ji kurdan, ji zimanê û welatê wan re nayê û Enfal û Helepçeyan layiqî wan dibînin. Li Suriyê politikaya kemera Erebbî⁴, li Tirkîyê jî gund tîne valakirin. Li Îranê jî destê softayan kurd êş û azar dikşînin ji destê wan serokê kurdan yê wek Qasimlo jî nikarin rizgar bibin. Heya li Ewropayê jî xwîna wan dirijînin. Li rojhilata navîn kurd kerwanên bê serî û bê dawî ne (34-35).

Em îmaja xerap a welat di *Heftetek Dirêj Li Amedê* de jî dibînin ku li aliyekî Kurd di bin zextan de ne, li aliyekî jî kesên ku li ser wan kar dikin xema wan ne zimanê kurdî ye ne jî azadiya gele kurd e. Bêhtir ew ketine li pey berjwendiyên xwe yê şexsî û partiyê (Husên, 2015: 46). Dîsa ev îmaja neyînî di *Amîdabadê* de jî derdikeve pêşberî me.⁵ Di *Amîdabadê* de çîrok li Amîdabadê dest pê dikin ku ev der di eslê xwe de Amûdê ye. Vegêr behsa bav û bapîrên xwe dike û dibêje bav û bapîrên me yê ku di gorê de radizin tu carî ne di wê baweriyê de bûn ku dê rojek wiha çêbibe. Leşkerên Bronzî çav bera gencîni û keçên çavreş û putsipî yê Amîdabadê dabûn. Ew bi ser ketibûn. Gencîniya Amîdabadê jî xwe re birin û leşkerên ên mayî jî çand ziman, orf û edetê xwe bi darê zorê bi amîdabadiyan dane qebûl kirin. Paşê jî leşkerên Bronzî hatin wan jî agir berdan daristanên Amîdabadê. Jin û zarokkustin. Li gor leşkerên bronzî nîjada herî baş û yê mezin ya wan bû. Ji ber van sedeman gelê Amîdabadê mecbûr man ku bidin pey rêya xeribiyê. Koça mezin bi vî awayî dest pê kir. Gelê Amîdabadê dikaribû li ber xwe bidaya lê ew bêhiş bûn û ketin pey riya xeribiyê çareseriyê erzan (11-14).

Husên heman rabêjî di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de gelek caran bi kar tîne. Heta mirov dikare bibêje ku îmaja neyînî ya welat herî zêde bi awayekî aşkera di vê romanê de tê dîtîn ku di heman demê de ev romaneke otobiyografiyê e. Di vê

⁴ Polîtîkayên erebkirinê gelek caran di edebiyata kurdi de tê dîtîn. Bi taybetî jî di nav kurdên ku li Suriyê dijîn. Mele Ehmedê Palo jî yek ji wan e ku gelek caran di nav helbestên wî de em rastî vê yekê tînin. (Palo, 2022: 45-46-167-238-401)

⁵ Divê mirov bibêje ku di *Amîdabadê* hey dawî em navê vegêr nabihîsin. Lewra penaber digel ku bênasname ne di heman demê de bînav in jî.

romanê de ew dibêje ku her çend Amûdê warê zaroktiya wî be jî di heman demê de ew cihê êş û azarê ye. Dema ku ew Amûdê pênase dike dibêje Amûda şewitî, paytexta evînê, navnişana hêvî û birînê ye (Husên, 2014: 9). Kesekî nabêje Amûda şêrîn heta hin kes dibêjin Amûda şewitî lewra ev der cihê malikwêraniyan e. Cara yekem di sala 1937an de hatiye şewitandin. Lê di sala 1960î de bajar careke din şewitî lê vê carê sinemaya bajêr şewitî Amûdê bi rastî jî bû Amûda şewitî. Sedan zarok bûn qurbaniya vê şewatê. Zarokên Amûdê ji bo ku filmekî temaşe bikin bi darê zorê Sînemeya Amûdê û li wir şewitî. Li her derê Amûdê tevlihevî heye. Hin xwe diavêjin ser zarokên ji şewatê xilas bûne, hin berê xwe didin mizgefta bajêr ji bo ku zarokên xwe yên şewitî bibînin. Bêhna mirinê û goştê şewitî li her derê bajêr berbelav bûbû. Jinan por bi serê xwe nehiştin hin bi cinan ketin. Ji her malê zarokek di wê şewatê de mir (40-42).

Çawa ku desthilatdaran di şewata sînemeya Amûdê de zarokên kurdan ji wan stendibûn bi heman awayî dixwestin ziman û çanda wan jî ji wan bistînin. Bo nimûne Li gor Said (2009: 177) çand di berxwedanê de roleke sereke dilîze. Heger nasnameya siyasî li ber tunebûnê be, çand ji bo şer û berxwedanê dibe amûreke bêhempa. Lewra parastina çandê di heman demê de parastina hafizayê ye û bi ziman re jî eleqedar e. Bo nimûne li gor Chambers (2005: 37) ziman ne tenê ew tişt e ku bi kêrî ragihandana tê ew di heman demê de di avakirina nasnameya çandî de jî amûrek e. Bi taybetî jî parastina çand û ziman du xalên giring in ji bo civakên dîasporîk. Di vê çarçoveyê de mirov dikare heman tiştî ji bo Husên jî bibêje. Ji bo wî ziman û çanda kurdî rasterast bi nasnameya kurdî re eleqedar e ku rejîma dewleta Suriyê dixwest ziman û çanda kurdî ji holê rake. Rejîma Baas heya sala 1970yî jî polîtîkaya homojenkirina civaka Sûriyeyê bi rê ve dibir. Li gor vê polîtîkayê divê hemû hemwelatîyên Sûriyeyê li derdora îdeolojiya Baasê bûbûna xelek (Tejel, 2009: 59). Em van xalan di berhemên Husên de jî dibînin. Bo nimûne di *Nameyek Ji Bavê Min Re* de ji devê Feremez wiha tê gotin: Li ser axa me ya di navbera Dicle û Firatê de, min zimanê frensî û erebî bi hev re li dibistanê xwendin. “Mirov dikaribû fêrî hemû zimanên dinyayê bibûya, tenê zimanê ku ez bi xwe û birayên xwe û bi zarokên taxê re dipeyivim qedexe bû.” (Husên, 2021: 36). Dîsa di *Piçek Jiyan Qetek Asîman* de em rastî heman mijarî tên. Li Amûdê zimanê kurdî qedexe ye mirov nikare li vî bajarî bi zimanê kurdî bixwîne. Ji bo ku mirov kirasê gundîtiyê ji ser xwe biavêje û di nav cihana medenî de cih bigre divê mirov dev ji zimanê kurdî berde û erebên ku ji derve tên divê ji xwe re bike nimûne. Li vî bajarî tenê Mele Ehmedê Herbî bi zimanê kurdî bi zarokan re dipeyive lewra ew ji wî hez dike (Husên, 2014: 27-28). Mele Ehmedî Herbî di cihana wî ya edebî de cihekî giring digire lewra ew bi kurdî diaxive. Ji ber vê yekê ye ku em Mele Ehmedî Herbî di *Nameyek Ji Bavê Min Re* de jî dibînin. Ew qehremanê zarokatiya wî ye.

Li gor Tejel (2009: 63) di polîtîkayên dewleta Suriyeyê de netewperweriya erebî xala sereke bû. Ev yek di sala 1973an de bi awayekî eşkera di makezagona dewleta Suriyê de jî hate nivîsandin. Lewra nasnameya erebî êdî tişteki wisa bû ku divê herkes bi darê zorê qebûl bikira. Di nav vê çarçoveyê de kurdbûn ji aliyê fermî ve bû tişteki xeternak. Em van yekan di berhemên Husên de dibînin. Beriya

desthilatdariya Sûriyeyê, Amûdê cihêkî kozmopolît bû hem warê fileh hem jî ya misilmanan bû. Her çend li vê derê kurd zêde bin jî desthilatdariya siyasî di destê fileh û ereban de ye. Ji kurdan re jî tenê dîn û îman dimîne. Ew ji kurdan re dibêjin tevî karên siyasî nebin biçin medreseyan û tenê bi karê axîretê ve mijûl bibin (Husên, 2014, s. 20). Lê mozaîka ku li Amûdê hebû ji aliyê rejîma Sûriyeyê ve tê xerakirin. Mixaberat dijminatîyî dixê navbera şênîyên bajêr (104). Heta kurd jî herî zêde bi hev du re şer dikin (99).

Rejîma Sûriyeyê bi her awayî dixwaze kurdan tune bike. Ji ber vê sedemê jî ereban li herêma kurdan bi cih dike. Ji ber kemera erebî gelek kurd li ser axa xwe dibin penaber (Tejel, 2009: 62). Ev yek jî di romanê de tê dîtin. Bi şewata zarokên Sînemeya Amûdê ve Çemê Amûdê jî dikeve ber mirinê. Sed hezar kes li Ceziriyê dibin penaber (Husên, 2014: 31). Desthilatdariya Sûriyeyê dest datîne ser xaka kurdan û fermanar, cenderme û endamên mixaberatê di wê baweriyê de ne ku ew her çi bixwazin dikarin bi kurdan bikin. Ew bi çavê pez û sewalan li kurdan dinêrin (86-87). Her çend li Sûriyeyê desthilatdarî biguhere jî ji bo kurdan tiştê naguhere. Kurdbûn wekî afyon e gelek kurd dixwazin ji kurdbûna xwe birevin, hin ji wan xwe dikin ereb hin jî dibêjin em qûreyşî ne (38-39). Li vî bajarî her tişt ji bo ereban serbest e lê ji bo kurdan qedexa ye.

Bo nimûne sînor di *Pîçek jiyan Qetek Asîman* de wekî sembolekê derdikeve pêşberî me. Li gor Nejat Abdullah (2019: 117) piştî têkçûna dewleta Osmanî sînor bû parçeyê nasnameya polîtîk ya kurdan. Lewra erdnîgarî û cîvaka kurdan parçe bû. Hamelink û Bariş (2014) di nav vê çarçoveyê de diyar dikin ku sînor bi taybetî di stranên dengbêjan de ji ber ku erdnigariya kurdan parçekiriyê netîştêkî meşrû ye. Sînor tê wateya kuştin, sirgûn û bêwelatî ku ev gelek caran bûne mijara sînemeya kurdî jî. Bo nimûne di filmên Behman Ghobadî em vana bi awayeke aşkera dibinin. Di filmên wî de sînor wekî metaforek hatiye bikaranîn. Erdnigariya kurdan ji hêla sînorên çêkirî ve hatiye parçekirin. Li gor Kılıç (2009: 150) di filmên wî de ya çîrok li sînorê derbas dibin an jî karakter gelek caran di navbera sînorê Îran û Iraqê de diçin û tînin jî ber vê jî sînor cewhera sinemaya Ghobadî ye. Bi heman awayî sînor di romana kurdî de jî mijareke sereke ye ku parçebûna cîvaka kurdan temsîl dike (Pariltî û Galip, 2010:182). Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku sînor ji kilamên dengbêjan bigrin heya romana kurdî gelek caran wekî metaforeke ku erdnigariya kurdan parçe kiriyê hatiye bikaranîn ku em vê yekê di edebiyata Husên de jî dibinin.

Di *Pîçek jiyan Qetek Asîman* de jî behs tê kirin ku ji bo ereban sînor tune ye. Ereben Misrê bi hêsaniyê dikarin werin Amûdê li wir kar bikin lê di navbera kurdan de sînor hene. Gorên wan li aliyê din ê sînor mane ji ber vê jî ew nikarin herin ser gorên bapîrên xwe jî (Husên, 2014: 36). Sînor tê wateya leşker, teqîn, memûrên xerab yê her du alîyan. Em teswîrkirina îmajê neyînî ya sînor di *Amîdabadê* de jî dibînin. Di *Amîdabadê* de vegêr û hevalê wî Seydo xwe bera ber bi sînor didin. Ji sînor tirsaxa xerdelê kêmbê, şênîyên bajêr bi vê tirsê dijîn ku ev referansî qetlîama Helepçeyê dike. Leşkerên amerîqî û sovyetê li ber çavên wan dikevin. Ew dibe başoke û difire li ser sînor. Leşkeran bera wî didin ew birîndar dibe. Wê roj sê

milyon kesan dest bi koçê kir û li deriye Ewropayê xistin (Husên, 2015: 41). Ji ber van yekan mirov dikare bibêje ku sînor tiştêkî xerab e di cihana wî ya edebî de. Sînor tiştêkî nexwezayî bû, civak û erdnîgariya kurdan parçe kiribû û divê bihata rakirin.

Bi îmajê neyînî yê sînor re têkildar, Ferecê Şêxê Koro ku qaçaxçiyekî navdar bû, derdikeve pêşberî me. Li gor Tejel (2009, s. 67-68) qaçaxçîtî ji bo kurdên herêma Cizîrê tiştêkî giring bû. Bi saya qaçaxçiyên rewşa aborî ya xerab hinek sererast dibû. Her çend Tirkiyeyê dixwast pêşiya vî karî bigre jî qaçaxçîtî her ku diçû zêde dibû. Hin qaçaxçî gelek dewlemend bûn û êdî wekî lordên qaçaxçiyên dihatin zanîn. Hin ji van qaçaxçiyên ku girêdayî rejîma Baasê bûn, ji ber vê jî gelek dewlemend bûn û ji xwe re qesran çêdikirin. Lê Ferecê Şêxê Koro berevajî wan dijberî rejîma Baasê bû lewma kurdên herêmê ji wî hez dikirin. Wî ev sînorên çêkirî qebûl nedikir. Her du aliyên sînor jî welatê wî bûn, ew li ser xaka xwe diçû û dihat û ne mecbûr bû ku li bendî destura her dû hikûmetan bisekîniya. Ji ber vê yekê ye ku Apê Ferecê Şêxê Koro qehremanê Husên ê zarokatîyê ye. Ew wekî Rustemê Zal, Mîrza Mihemed û Kawayê Hesînkar e. Ew serokê qaçaxçiyên bû û bêhn li desthilatdaran diçikand û digot dewlet ez im. Amûdê ez im (Husên, 2014:159-164). Lewra Ferecê Şêxê Koro jî wekî Mele Ehmedê Herbî qehremanekî zarokatiya Husên bû ji ber ku wî jî wekî Mele Ehmedê Herbî desthilatdariya sîstema Baasê qebûl nedikir û sînorên ku di navbera kurdan de hatibûn xêz kirin parçe parçe dikir.

Piçek Jiyan Qetek Asîman romana bajarê Amûdê û ya serpêhatiyên zarokatiya Husên e. Ev bajar di bin desthilatdariya Suriyeyê de bi mixaberatê hatiye dagirkirin ji ber vê êdî jiyaneke bi aram li vî bajarî nemaye. Ji ber vê jî ew di dawiyê de mecbur dimîne ku Amûdê bihêle û biçê Parisê. Bi awayekî balkêş dema ku Sûriyeyê terk dike polîsên ku pasaportên wî kontrol dikin jê re astengî dernaxin lewra li gor erebperest û mixaberetê kurdek jî Sûriyeyê derketa ev tiştêkî baş bû, ji ber ku wan nedixwestin ku kurdek jî li navçeyê bima. Wî wekî Mîrza Mihemed marê ziya nedikuşt û azadiyê li bajarê xwe venedigerand lê herî kêr wî dizanibû ew kî ye û xwe nedifroşt hêzên biyanî. Ew kurdek bû ku nikaribû xwe ji xewnên zarokatiya xwe xilas bike (Husên, 2014: 261). Ereberperestî rê nade ku mirovên li Amûdê dijîn bi rengên xwe bimînin lewra ew dixwazin herkes bibe wekî hev anku bibin ereb. Ebu Kato jê re dibêje ku divê ew dev jî vî bajarî berde û biçê Parisê anku bajarê ronahiyê. Baweriya wî ew bû zimanê fransî ji bo wî hatiye çêkirin lewra divê ev biçûya Sorbonnê da ku zimanê fransî bixwîne (141). Lê wekî ku em ê di berhemên Husên yê din de bibînin çûyîn her çend wekî rêya felatê bê dîtin jî ew ê bi xwe re êş û eleman jî bîne.

Fîraq: Penaberî, Melankolî û Biyanîbûn

Çûyîn ji bo hemû penaberên rêya felatê ye. Ew ji bo ku jiyaneke aram û dewlemend bibînin û ji zilm û zordariyê, ji kuştin, girtin û talanê xilas bibin direvin. Ji ber vê yekê ye ku penaberî problemeke sereke ya hemû dewletên cihanê ye lê ji ber ku ji her derê cihanê bi milyonan kes ji bo jiyaneke çêtir berê xwe didin Ewropa û Emerîqayê, herî zêde problema cihana Rojava ye. Êdî komên penaberan li

bajarên mezin ên wekî London, Berlîn, New York û Parîsê bêhtir xwiya dikin. Her çend welatê cîhana sêyemîn ji hêla welatên Ewropî ve hatibin paşguhkirin jî bi rêya penaberiyê ew dibin parçeyeke jiyana Ewropayê. Ew bi xwarin vexwarin, mûzîk û bi aboriya xwe vegeriyan bajarên Ewropayê û van deran bi her awayî dagir kirine (Chambers, 2005: 12). Bi taybetî jî Parîs bajarekî wisa ye, li vî bajarî jî mêtîngehên kevnare gelek kes dijîn (Said, 2016: 47). Lê ev rewş dibe sedem ku di nav Ewropayê de gelek problemên navxweyî derkevin. Bo nimûne îro civakên dîasporîk li Ewropayê ji hêla gelek nijadperestên ewropî ve wekî mirovên nebaş û xetere têne ditîn. Li gor wan ji ber penaberan li Ewropayê aramî nemaye. Dîgel van yekan ji ber sedemên civakî, çandî û aborî di navbera civakên xwedîmal û penaberan de şer û pevçûn derdikevin (Sheffer, 2003: 29).

Di nav vê çarçoveyê de her çend kurd wekî civakên cihana sêyemîn ne ji koloniyên kevin bin jî jiyana wan a koçberiyê ji penaberên ku li Parîsê dijîn ne zêde cuda ye. Ew jî wekî penaberên din êşa penaberiyê dikişînin. Heger em behsa hatina kurdan a Fransayê bikin, em dikarin bibêjin ku kurd ji salên 1960î ve ji ber sedemên cuda berê xwe dane Fransayê. Lê ev hejmar her ku diçe zêde dibe. Sedemên sereke şerê navxweyî ya başûr, Şoreşa Îslamî ya Îranê û darbeya leşkerî ya Tirkiyê ne (Khayati, 2008:142-143). Le her çend kurd ji bo jiyaneke çêtir hatibin vî welatî jî rewşa heyî û tiştê ku wan hêvi dikirin ne wek hev bûn. Bo nimûne li gor Khayati (2008: 49) kurdên li Fransayê dijîn bi taybetî jî kurdên serhedê li gorî kurdên Swêdê di nav şert û mercên xerab de ne. Her çend penaberî tiştêk zehmet be jî ji bo kurdên serhedê du carê zehmet e. Ew nikarin adapteyî civakê fransîyan bibin, divê mîna ku ew di nav vê civakê de tunene tevbigerin. Ew nikarin xwe bigihînin sazîyên civakî û yên dewletê. Penaberên li vir dijîn wekî Swêdê di qadên sîyasî û civakî de ne xwedî hêz in. Sedema vê yekê cudabûna polîtîkayên fransî yên ji Swêdê ne. Ji ber van yekan ji bo penaberan Fransa ne cihekî mayîne ye, bêhtir wek cihekî transît e. Kurdên ku têne vir dixwazin herin deverên din yên Ewropayê (Khayati, 2008: 253). Her çend Khayatî van bi taybetî jî bo kurdên serhedê yên li Fransayê bibêje jî ev yek ji bo hemû penaberan derbasdar e. Lewra penaber bi rihetî nikarin adaptayî civaka xwedîmal bibin. Said (2014: 249) di nav vê çarçoveyê de dibêje ku sirgûnî xwe her dem wekî çîna dûyemîn dibinin. Ew ziman û çanda serdestan hîn bibe jî ev rastî ew ê neguhere penaberî tiştêkî seyr. Ew vê yekê herî zêde dema ku Filistin di sala 1948an de tê dagirkin hîs dike. Said berê xwe dide New Yorkê ku ew bajar ew ê hêdî hêdî giyana wî bikuje. Li vî bajarî bala tu kesekî ne li ser wî ye, ew tenê penaberek ji rojhilata navîn e (184-185). Li gor wî sirgûnbûn ji aliye zihnî ve valahiyek e. Pir zehmet e ku mirov êşa sirgûniyê ji ser xwe biavêje ji ber vê yekê ye ku hem tarîx hem jî edebiyat vê êşe jixwe re kirine mijareke sereke. Her çend mirovê sirgûnî li sirgûnê gelek tiştan bi dest bixe jî ew ê her dem biyaniyek be (Said, 2006: 28). Sirgûnbûn ruhê zivistanê ye û bêcih û bêwarbûn e (42).

Said (2006: 15-16) ne tenê rewşenbîrekî bû ku derbarê sirgûniyê de hin tişt dinivîsandin wî bixwe jî sirgûniyê tecrûbe kiribû. Ji ber vê jî ew psîkolojiya sirgûnbûyîne baş dizanibû. Sirgûnî li gor wî di navberê de maye; hem aîdî her derê ye hem jî aîdî ne tu derê ye. Wekî ku Safran (1991) jî diyar dike ku penaber dê tu

carî ji aliyê civaka xwedîmal ve neyên qebûlkirin û ev rewş ew ê bibe sedem ku kesên sirgûn bibin biyanî û melankoli û xemgînî jî bibe parçeyê derûniyeta wan (Sazzad, 2017: 1). Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku wekî ku Mishra (2007) jî dibêje hemû civakên diasporîk xemgîn in lê xemgîniya wan ji hev cuda ne lewra wan barê sirgûniyê girtine ser milê xwe. Em van xalên ku heya niha hatin behskirin bi hêsanî di berhemên Husên de dibînin. Ji ber ku melankolî û biyanîbûn parçeyên cihana wî ya edebî ne.

Ji ber ku sirgûnî ji hemû nas û dostên xwe û nasname û dîroka xwe tê veqetandin sirgûn serpêhatiyêke travmatîk e (D'addario, 2007: 8). Sirgûnî ji erdnigariya xwe hatiye veqitandin lê ew ê nikaribe bibe parçeyê civaka nû jî (Said, 2006: 36). Ev yekan ji bo edebiyata Husên jî derbasdar e. Parîsa ku bajarê evîn û romantîzmê e ye ji bo hemû karakterên wî warê tenhayî, biyanîbûn û melankoliyê ye. Bo nimûne di *Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê* de Evdo Kurdekî Helepçeyî ji qetlîamê xilas bûye û Bijîşkên Sînor Nasnakin wî dibin Parîsê. Lê li vir tu carî nikare xwe aîdî Parîsê bibîne her dem di hişmendîya wî de vegera welat heye. Parîs her çend bajarê xewnan be jî, ji bo Evdoyê Helepçeyî bajarê tenhayî ye. Wî tenhayiyê li xwe mahr kiriye (Husên, 2013: 14). Disa di *Nameyek Ji Bavê Min* Re de vegêr her dem di navberê de maye. Li hêlekê şowba koronayê li hêlekî jî tevliheviya rojhilata navîn heye. Lewra dibêje “Ji ber çikin baranê çû ber mezzîbe” pir li min tê (Husên, 2021: 90). Rojên koronayê ne û ew 42 sal in li Parîsê dijî, ew der êdî bûye welatê wî yê duyemîn lê dîsa jî ji xaka xwe dûr e û ev dûrbûn wî diêşîne (9). Fransa ji welatê wî pêşketîtir e lewra ev welat ji bo wî dil û can be jî ne ya wî ye, ew bê welat e (115)

Di *Amîdabadê* de jî dîsa em rastî rewşa melankolîk û biyanîbûnê tên. Li Ewropayê jîyan ji bo penaberên wekî wan ne baş bû (Yekdeş, 2015-2016). Hevalê wî Seydo destê xwe xistibû ber makîneyê, destê wî jê bûbû û makîne destê jêkirî daqûrtandibû nav xwe. Dema ku ew û Seydo li îstgehê hev dibînin ji bêrêş û azarên wan kişandine hev du hembêz dikin. Ew û hevalê wî Seydo xwe bera binê erdê metroyê didin. Dema dikevin binê erdê başoke û eylo li ezmanekî şîn baskê xwe li hev dixin (Husên, 2015: 41). Li Parîsê dema dengê hevalekî xwe ji welat dibîhîze her dem kêfxweş dibe. Seydo hevalê wî ye û bi zimanê dayika wî diaxive. Her çend li vî bajarî bi milyonan însan bijîn jî ew di nav tenhayiyek de ye. Ew her dem siwarê mêhîna êşê⁶, biyaniyek bi tena serê xwe ye. Dema ku ew berê xwe dabû Parîsê di wê baweriyê de bû ku keçên porzer ji bo lawikên wekî wan porreş dîn û har dibûn, ew ê bûbûna xwedî mersedesên sor lê rastî yekcar cuda bû (36-37). Ev bajar cihê tenhayiyê ye li vir mirov nikare behsa kul û kederên xwe ji kesekî re bike (89).

Di *Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê* de êşa penaberiyê careke din derdikeve pêşberî me. Vegêr dibêje dema kurd li Ewropayê dibin penaber kesekî guh nade wan. Penaberîya wan were qebûlkirin jî frensî weke kuçikan li wan dinhêrin. Ne

⁶ Ev çîrok di heman demê de di *Siwarên Êşê* de jî heye. *Siwarên Êşê* yekem pirtûka Husên e. Ev berhem li ser bergê wê wekî “novel” hatiye pênasikirin. Lê hin beşên vê pirtûkê di *Amîdabadê* wekî çîrok cih digirin.

wekî kûçikên xwe jî wekî kûçikên efrîqî, Rohjilata navîn û hemû welatên bêxwedî (Husên, 2013: 35). Evdo piştî vegera Îthakayê dema ku berê xwe dide meyxaneyê, hevalên xwe yên frensî dibîne û dibêje ev frensî bê bext in gelek tiştan bi dû mirovan dikin. Ev jiyana xwe wekî çemekî dibîne jiyana wî li Kurdistanê dest pê kiribû û li taxên Parisê dimire (108)

Parîs bi rastî jî ji bo penaberan bajarê tenhayî û biyanîbûnê ye. Ev bajar bi penaberên xwe navdar e û di heman demê de cihekî wisa ye ku mirov di nav tenêtiyekê de bi awayekî biyanî dimirin (Said, 2006: 31). Em van bi awayekî aşkera di *Parîsabadê* de dibînin. Di *Parîsabadê* de veqer dema ku nûçeya mirina bavê xwe dibihîze ev yek teşîreke mezin li ser wî dike. Jixwe li vê Parîsa xopan bi tenê bû û difikirî ku li vê derê ew ê di nav tenêtiyê de biçilmise (Husên, 2010: 17). Dema li Parisê di jî her dem welat di bîra wî de ye. Li vî bajarî her tişt Amûdê tîna bîra wî heya dema ku lehmeçûnan dixwe jî lingên wî li axa Amûdê dikevin (21). Parîs bajarekî xweşik û cihê kêf û şahîyê ye lê ji bo kesên wekî wî ev der cihê biyanîbûn û melankoliye ye (31). Parîsî û frensî di hişmendiya wî de ne kesên baş in. Parîsî xwînsar û frensî xweperest in. Pascal her çend mirovek baş be jî dixwaze henekê xwe bi penaberên wekî wî bike ji ber vê lîstikek tîne serê wî. Ji ber vê jî ew dibêje ku tu kes nikare vî dewarî biguherîne (72).

Husên di *Barê Şevê* de aliyên neyînî yên Parîsê bi awayekî aşkera radixe ber çavan (Çiftçi, 2022; Yeşilmen, 2014: 65-90). Wekî ku Khayati jî diyar dike (2008: 83-85) koçberî tişteki zehmet e û kurdên dîasporayê jî gelek caran van zehmetiyan dikişînin. Tîrsa derbaskirina sînor û polîsan, kuştin, qeçaxçiyar, qezayên keştiyan kampên penaberan û pêvajoya penaberiyê hişmendiya wan ava dike. Di dawiyê de ew ê bigihijin Ewropayê lê ev nayê wateya xelasbûna êş û azarên koçberan ku em van rasterast di *Barê Şevê* de dibînin. Di vê romanê de çar karakterên sereke, ji çar parçeyên welat hene. Ew rojekê amedekariya xwe dikin da ku biçin bihuştê ser dinyayê ye anku Ewropayê. Sîno kurê Mele Gundiro ye ku ew mirovek sextekar bû. Li Amedê her tişt xerab e. Mirov mecbûr dimînin ku dev ji gundên xwe berdînin û Mele Gundiro jî berê xwe dide Amedê li vir dest bi çêkirina nivîst û berbêjnkan dike. Sîno mirovekî jêhatî bû, fransîzî hîn dibe û ji bo ku ji hemû tiştên xerab yê vî bajarî xilas bibe berê xwe dide Ewropayê (Husên, 2012). Ji bo Sîno Tirkîyê cihê xirecirê ye û ji bo paşerojê baş divê Sîno biçûya Ewropayê (22). Li gor Dara gelek xortên navçeyê berê xwe didan Ewropayê. Piştî çend salan dewlemend dibûn li otomobîlekê siwar dibûn, vedigeriyan gund û sînga xwe wekî elokan dinexandin (26). Dara jî ji bo hinek jiyan pars bike berê xwe da Ewropayê (38). Şêrko xortekî ji Mahabadê ye wî tu tiştê ji jiyana xwe ya Kurdistanê û Îranê fêhm nekiribû, wekî gelek xortan dixwest ku li Ewropayê bigihîje jiyanê bextewar (39). Li gor baweriya Şêrko heger ji destê wan bihata tu kesek jî li rojhilata navîn nedima, dê hemûyan jî berê xwe bidaya Ewropayê (42). Ristemê Zalê Rojavayî ne qehremanê Şehnameyê bû beravajî vê ew li ser xaka xwe bûbû penaber û mecbur mabû ku berê xwe bidana Ewropayê (51). Çûyina Ewropayê ji bo her çar karakteran wekî rêya felatê bû lê di heman demê de destpêka êşên nû bû jî. Lewra tiştên ku ew li hêviyê bûn û rastî ew ê li hev nehatana.

Dema ku her çar karakter digel êş û azarên xwe digihîjin Parîsê ji bo wan jiyaneke nû dest pê nake. Ew tenê penaberên ji rêzê ne û ne di xema tu kesî de ne. Wekî Eliassi (2012: 100) jî diyar dike penaber di rabêja netew dewletan de yên din in. Her çend ew rojekî bibin hemwelatî jî ew ê tu carî nikaribin bibin wekî hemwelatîyên resen ên van dewletan. Ev yek bi taybetî ji bo Fransayê jî derbasdar bû. Gelek kurdên koçber piştî gelek êş û azaran dema ku digihîjin Fransayê rastî zehmetiyên nû tên. Gelek ji wan di dema serlêdana penaberiye diçin OFPRA û li vir rastî zehmetiyên tên. Carinan jî ji hêla polîsên frensî ve dihatin taçîzkirin (Khayati, 2008: 149). Em ê van tiştan di *Barê Şevê* de jî bibînin. Her çend, her çar karakterên sereke piştî gelek zehmetiyên xwe bigihînin Parîsê jî girtina mafê penaberiye dê ji bo wan bibe îşkence. Ev bajarê ku ji bo gelek kesan bajarê xewn û xeyalan bû dê ji bo wan bibûya goristanek. Ew ê her dem mecbûr bimînin ku ji ber polîsên frensî birevin.

Her çar karakter jî serî li penaberiye didin û li benda roja pesendkirina kaxêzên xwe disekin. Bi vî awayî sê sal derbas dibin lê Ristemê Zal nikare kaxiza penaberiye bi dest bixe. Rojek dibihîse ku heger birîndar bibe ew ê zûtir kaxiza penaberiye bi dest bixe ji ber vê jî xwe diavêje bin erebeyeke lê nafilite û dimire (Husên, 2012: 79). Şêrko jî nikare mafê penaberiye bistîne ji ber vê jî hikûmeta frensî jê daxwaz dike ku welat biterikîne lê vegeer ji bo wî tê wateya mirin an zîndanê. Ew dixwaze bibe wekî kûçîka xanima frensî ku her roj didît. Ew li kêleka Çemê Seinê rûniştiye û difikire. “Ew ji bo vê xewnê, bajar û malbata xwe bi sedên qonaxan li dû xwe hiştibûn û wê şeve, li kêleka çemê Seinê bibû wek parsekekî nizanibû çî xweli li serê xwe bikira lê ne poşman bû. Ew ji sêdar û hemû şewatên Kurdistanê dûr ketibû û wî ji can û dil dixwast bibûya weke segê wê rojê, ew çarnigê bê serêş û bê qiriktafî.” (87). Ew bi van bîr û baweriyên li kêleka çemê ji serma diqûlîfe û dimire. Darayê başûrî jî di heman rewşê de ye. Lê ligel wî em rastî penaberekî din tên ku dara evîndarê wê bûbû. Zîbaya ku efrîqû bû li kolanên Parîsê laşe xwe difiroşe lê dema ku vedigere welat porê xwe digre, Qûranê dixwîne û rojî digre. Ew jî wekî Dara bê cih û bê war e. Ji Dara ducanî bû. Dema zarokê wan çêbibe dê navê wî bibe Hîwa. Daxwaza Dara ya penaberiye tê redkirin û ji ber vê derûniyeta wî xirap dibe û xwe bi dar ve dike (95-114). Di nav her çar karakteran de tenê Sîno dikare mafê penaberiye bistîne ji ber ku ew jî wekî bavê xwe mirovekî sextekar bû, xwe wekî êzdiyekî pêşkêş kiribû û bi vî awayî mafê penaberiye stendibû (120).

Husên bi vî awayî rewşa penaberan nîşan dide. Li gor wî penaberî bênasnametî, bêcih û bêwarbûn e. Wekî ku di şexsê her çar karakteran jî nîşan dide ku ew dikaribûn vegeeriyana welatê xwe lê di berdila vegeerê de wan kûçîkîyê hilbijart. Bi taybetî jî di çîroka Şerko de em vê rabejê dibinin. Lewra ew qîma xwe bi jiyana segan li Fransayê dianî lê ne bi ya mirovên rojilata navîn. Ew dikaribû welatek azad daxwaz bikirana lê berdila wî de ew dixwast bibûna kûçîkê ew jina frensî (88). Ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku Husên rexneyên tûj bi taybetî li penaberan lê bi giştî li civaka xwe jî dike ku ev yek gelek caran di rabêja diasporayê de tê dîtin. Bo nimûne (2009: 26) Said her çend wek nûnerê doza filistîniyan bihata

dîtin jî di heman demê de rexneyên tuj li hember civaka xwe jî dikir. Li gor wî sedema pêşvençûna demokrasîyê di nava civakên rojhilata navîn de ne tenê bi emperyalîzm, despotîzm û rejîmên dejenere re eleqedar bû. Di heman demê de civak û rewşebîrên rojhilata navîn jî ji hişmendîya demokrasî, azadî û mafên mirovan bê par in. Ji ber vê jî divê rewşebîr her dem li ser rewşa civaka xwe bifikirin û xwe rexne bikin ku ev yek ji bo pêşvebirina civakê xaleke sereke bû. Bi heman awayî li gor Eliassi (2012: 130-131) jî hişmendîya dîasporayê di heman demê de bîr bawerîya netewperweriyê di nav xwe de dihewîne. Ji ber ku penaber tam nikaribin bibin aîdî welatê ku koçî wir kirine û bêhtir berê wan li welatê wan e. Lewra êş û azarên ku kurdan li welatê kîşandine jî her dem hişmendîya wan ava dike.

Di nav vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku li gor Husên hişmendîya netewperwerî di nav penaberan de kêr bû û berdila jixwe re welatek ava bikin jiyanek biçûk tercîh dikirin ku ew yek taybetmendîya nivîskarên dîasporîk e. Bo nimûne li gor Said sirgûnbûn her çend xwedî gelek aliyên neyînî be jî çalakiyêke rewşebîrî ye. Lewra sirgûnbûn di heman demê de rê dide sirgûnî ku cihana ew tê de dijî bi çavekî dine bibîne û binirxîne (Sazzad, 2017: 18-19). Sirgûnî hewl didin ji xwe re cîhaneke alternatîf ava bikin bi gotîneke din hewl didin welatê xwe yê resen restorîze bikin. Ji ber vê yekê ye ku dîaspora di heman demê de maka netewperweriyê ye jî. Sirgûn û netewperwerî du têgehên ku bi hev du re peywendîdar in. Lewra netewperwerî ew tiştê ku aîdî zîmanek çandek û erdnîgariyêke. Sirgûn ji van tiştan bê par maye lê hewl dide ku van tiştan carek din bi dest bixe. Lewra netewperwerî xelasbûna ji biyanîbûnê jixwe re dike mijar û divê ji bo ku dawî li biyanîbûne were divê sirgûnî vegere welatê xwe. Ji bo vê yekê jî azadkirina welat elzem e (Said, 2006: 31-32). Sirgûnbûn di heman demê de çalakiyêk daxwaza azadîyê ye (Sazzad, 2017: 25). Dema ku welatê wan azad bibe dê sirgûnî bikaribin vegerin welatê xwe. Ji ber vê yekê ye ku vegera welat ji bo civakên diasporîk xaleke sereke ye. Kesên ku ji xaka xwe bi darê zorê hatine derxistin divê rojek vegerin welatê xwe, li ser xaka bav û kalan ku em vê yekê di berhemên Husên de aşkera dibînin.

Wuslat: Veger, Astengî

Li gor Brah (2005: 188) di hişmedîya civakên dîasporîk de welatê cihêkî mîstîk e, ew cihêkî wisa ye ku vegera wî jî ne mimkin e. Welat hem biranînên neyînî hem jî erênî di nav xwe de dihewîne, cihê serpêhatiyên zindî ye. Helbet ji bo daxwaza vegera welatê gelek sedemên cuda hene lê sedema sereke ew e ku penaber tu carî bi awayekî rast û dirûst nikarin adapteyî civaka xwedîmal bibin. Ew ê her dem mecbûr bimînin wekî kesekî biyanî û yê din bijîn. Lewra Eliassi (2012: 12) ji tecrubeyên xwe derdikeve rê û dibêje her çend li Swêdê bi awayekî kolektîf û fermî nijadperestî tunebe jî ew bixwe jî rastî tevgerên nijadperestî hatiye û jê re hatiye gotin ku ev der ne welatî wî ye divê ji vir biçê. Ev nîşan dide ku mirov xwedî pasaporta Swêdê be jî dîsa dikare rastî tevgerên serdestiyê were anku bi awayekî nefermî be jî dikare biçûk were dîtin (164). Swêd ji aliyê şert û mercên penaberan ve belkî jî welatê herî baş e lê li wî welatî jî îhtîmala ku mirov rastî nijadperestiyê

were heye. Penaber her dem di navberê de dimînin, ew dizanin ku cihekî wan ê mayînde tune (Chambers, 2005: 11). Ji ber van sedeman e ku penaber her çend xwedî şert û mercên baş bin jî her dem di hişmendîya wan de rojekê vegera welêt heye ku em van di berhemên Husên de dibînin.

Bêrîkirina welat anku gihîştina wuslatê xalên sereke ne di berhemên Husên de. Bo nimûne di *Parîsabadê* de di her kêliyê de Amûdê tê bîra vegêr; dema ku nexweş e li mala xwe ya qatê heftan a di nav şînkahiyê de ye. Amûdê jî wekî Parîsê di nav şînkahiyê de ye, çemê wê wek berê diherike (Husên, 2010: 79). Di hişmendîya wî de navê Kurdistanê li ser nexşeyan tune her çiqas welatekî xeyalî be jî mirov dîsa -dikare bi saetan li ser bipeyive. Rast e ku li vî welatî jî bilî çemê miçîqî û havînên pir germ tu tişt tune lê dîsa jî mirov dikare saetan pesnê wê bide û behsa gul û çîçekên wê bike (90). Welat ji bo wî di berdêla bavê wî de ye. Bavê wî û welat dibin yek û her kêliya ku bavê wî tê bîra wî xwe di nav ewlehiyê de hîs dike (80). Ew piştî 25 salan vedigere welatê xwe, çavê wî li bavê wî digere xwişkê wî xwe diavêjên hêmbêza wî û bixêrhatina wî dikin (93). Dema ku dikeve nav xwişkên birayê xwe ji bextewariyê kelogirî dibe. Lê êdî ew mirovekî biyanî ye ew êdî ne ew xortê ku 25 sal bere ji vî welatî koç kirî ye (95) Vegêr bi dilekî xemgîn berê xwe dide gorê da ku bavê xwe yê mirî bibîne û di rê de rastî navê bapîrê xwe dibe. Dixwaze biqîre lê deng ji gewriya wî dernakeve. Ji ber ku dema ew mir ew ne li ber serê wî bû û lêborînê ji bavê xwe dixwaze (96-97).

Di *Amîdabadê* jî em heman tiştî dibinin. Erê li welat şer û pevçûn hebû lê ew ê rojekî vegeriya welatê xwe. Ew li Parîsê di odeyêke pîsik de bi karekî biçûk debara xwe dike. Bi şev kar dike bi roj radikeve, ji civakê îzole bûye. Her çend li kêleka Çemê Seinê bijî jî di hişmendîya wî de her dem Çemê Amîdabadê heye. Her çend ew çem li gor Seinê wekî çiravek bû lê li ber dile wî şîrîn bû. Ew di wê baweriyê de ye ku rojekî ava vê çemê dê ber bi bihûşte ve biherike (Husên, 2015: 32-34). Her dem di hişmendîya wî de cihekî giring digire. Lewra di destpêka çîroka Siwarên Êşê di vegêr wiha dibêje: “Wek ku di destpêkê de em dilê taya çûyînê bûn, aniha jî em girtiyê nexweşiya vegeerê ne. Di şev û rojên welatên derbideriyê de, xewna vegera li ser warê kal û bavan, me digire û bernade. Ew xwe berdide canê me, geh biryara vegeerê xweş û hêsan dike, geh wê dike astengeke bêpayan zehmet û xewneke tije kâbus.” (51).

Dema ku ew êdî nikare xwe li ber wan hestan bigre dest bi karûbarên vegeerê dike. Ew ê vegeerî malê anku Amîdabadê. Lê herî zêde Seydo kêf dike lewra wan Parîsê ji parisiyan dihişt û piştî xwe didan eşên sirgûniyê, ew ê li trêna xwe siwar bibûna û berê xwe bidana Amîdabadê. Lê ew ê nikaribe vegere lewra li îstgehê ew ê rîya xwe wenda bike; trêna ku dê wî bibe Amîdabadê ji zû ve çûye û ew li paş maye. Di hişê wî de bavê wî heye. Bavê wî bi rîha xwe ya spî li îstgehê bi çavên şilmaskî li benda wî ye lê ew vê carê jî nikare biçê. Her dem dixwaze biçê Amîdabadê lê ew ê nikaribe biçê. Rojekê ji rojan ew ê jî li trenê siwar bibe û biçê, lê îroj ne ew roj e (51-60). Em daxwaza vegera welat di *Nameyek Ji Bavê Min Re* de jî dibinin. Bavê wî her dem li hêviya wî dimîne (Husên, 2021: 51). Dawiya dawî vegêr

dîsa berê xwe dide welatê xwe yê resen anku axa bav û kalan Amûdê, ber gora malbatê û ber serê bavê xwe (116).

Heftetek Dirêj Li Amedê li gor Fawaz hem romana Amedê hem jî ya Amûdê ye. Karakterê sereke Ferzende 50 salî ye û berê xwe dide Amedê û bi tenê 5 salan jî Odesîûs mezintir e. (Husên, 2015: 15). Berê Ferzende li Amûdê ye, ew dixwaze xwe bigihîjîne Amûdê û jî dûr ve jî be warê xwe yê kevnare bibîne (18). Ferzende li otobosa ku diçe Amûdê siwar dibe û xwe wekî Odîsîûsê ku dabû rîya Îthakayê dibîne, lê otobes berê xwe diguherîne û diçe bakur (158). Odesîûs qehremanê destanê Odesia bû ku wî jî wekî Ferzende dixwast vegere welatê xwe, lê di rê de rastî gelek astengiyan hatibû. Em ê çîroka Odesîûs di *Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê* de bibînin ku Husên di vê romanê de di navbera Evdo û Odesîûs de analojîyek ava kiriyê. Evdo Odesîûs bi xwe ye wî jî wekî wî berê xwe daye grava Îthakayê lê Odesîûs di dawiyê de gihiştibû girava xwe anku welatê xwe lê Evdo dê nikare bigihêje Halepçeyê (Husên, 2013: 20). Evdo berî ku bigihîje Îthakayê dile wî mîna teyrê hûr, şahbaz, eylo, qertel û xelean li dora xwe çêdike (86). Evdo di rê de rastî bilêtfiroşekî tê, ew hewl dide ku wî bi pereyek erzan bişîne Îtalyayê lê Evdo dibêje heger ew tevahiya Îtalyayê jî bide wî ew ê dîsa bere xwe bide Îthakayê. Gelek kes dixwazin wî ji rêya wî vegehnin lewra Îthakaya aniha ne wekî ya serdema Odesîûs e bi kêrî pişkûlekî jî nayê. Lê dîsa jî ji rêya xwe venagere (88). Evdo dema ku digihîje Îthakayê tenhayîya xwe ya Parîsê jî bîr dike mîna ku ew gihiştîye welatê xwe (99). Li Îthakayê her dem welatê wî anku Helepçe tê bîra wî. Dibêje heger xaza xerdelê nebûya ew ê li ba Nazenînê bûna li ser çoka wê bi şew li çiyayên Kurdîstanê binhêrta. Ev bextewariya herî mezin bû ji bo wî (103). Ew dibêje ez ê li ser grava Îthakayê jî Pênêlope û Têlêmakos re behsa Odesîûsê demên nû bikim (25). Di encamê de Evdo wekî Odesîûs gihaşt girava Îthakayê lê ew nikare bigihêje Îthakaya xwe ya rasteqîn anku Helepçeyê.

Encam

Vê xebatê dil kir ku ka gelo çawa fîraq û wuslat di berhemên Fawaz Husên de reng vedaye. Di encamê de hate dîtin ku di hemû berhemên wî de fîraq anku sirgûn û wuslat anku vegehnîna sereke ne. Di berhemên wî de îmajê neyînî ya welat heye. Lewra li welat kuştin, talan, komkuji, zindan û rejîmê totaliter hene. Ji ber vê jî her çend Amûdê warê wî yê zarokatiyê be jî, cihê êş û azaran e jî. Li welat du qehremanên wî yê zarokatiyê hene. Yek jî wan Mele Ehmedê Herbî bû ku wî ziman û çanda kurdî temsîl dikir yê din jî Ferecê Şêxê Koro bû ku wî jî desthilatdariyê û sînoren ku desthilatdar danîbûn qebûl nedikirin. Welat her çend cihê bîranîn wî yê zarokatiyê be jî ew li vir jî sirgûneke naxweyî ye. Rewşa welat dibe sedem ku karakterên wî dev ji welatê xwe berdin û berê xwe bidin koçberiyê. Çûyîn her çend wekî rêya felatê were dîtin jî koçberî bi xwe tiştek seyr e. Parîsa ku bajarê evîn û romantîzmê bû ji bo hemû karakterên wî cihê melankolî û biyanîbûn e. Ev der ji bo penaberan goristanek e. Kurd li vir nasnameya xwe û hebûna xwe wenda dikin. Lewra karakterên wî nikarin adapteyî vî bajarî bibin û her dem di

navberê de ne. Ew beriya welatê xwe dikin û bi wê hêviyê dijîn ku rojekê vegerin welatê xwe ew anku li hêviya gihîştina wuslatê ne.

Çavkanî

- Abdulla, N. (2009). İmparatorluk Sınır ve Aşiret, Kurdistan ve 1843-1932 Türk-Fars Sınır Çatışması. (M. Aslan, Wer.) İstanbul: Avesta.
- Brah, A. (2005). Cartographies of Diaspora: Contesting Identities. London and New York: Routledge.
- Bruinessen, M. V. (1998). 'Shifting National and Ethnic Identities: The Kurds in Turkey and the European Diaspora'. Journal of Muslim Minority Affairs, 18(1), 39-52.
- Chambers, I. (2005). Göç, Kültür, Kimlik. (İ. Türkmen, & M. Beşikçi, Wer.) İstanbul: Ayrıntı.
- Çiftçi, M. (2022). Penaberî di Lehengsazîya Romana Barê Şevê ya Fawaz Husên da li Gorî Rêbaza Realîzma Efsûnî. Nûbihar Akademî, 5(17), 55-69. doi:DOI: 10.55253/2022.
- D'addario, C. (2007). Exile and Journey in Seventeenth-Century Literature. Cambridge: Cambridge University Press.
- Eagleton, T., Jameson, F., & Said, E. W. (1993). Milliyetçilik, Sömürgecilik ve Yazın. (Ş. Kaya, Wer.) İstanbul: Kabcacı.
- Edwards, B. H. (2003). The Practice of Diaspora, Literature, Translation, And The Rise of Black Internationalism. Cambridge, Massachusetts and London: Harvard University Press.
- Eliassi, B. (2012). Ülkemde Bir Yabancı İsveç'teki Kürt Gençlerinin Aidiyet Politikaları. (H. İlhan, Wer.) İstanbul: Avesta.
- Hamelink, W., & Bariş, H. (2014). Dengbêjs on borderlands: Borders and the state as seen through the eyes of Kurdish singer-poets. Kurdish Studies, 2(1), 34-60. file:///C:/Users/mehmet/Downloads/Hamelink.Baris_Dengbejsonborderlands.pdf
- Hoffman, A. G. (1991). Between Exile and Return; S. Y. Agnon and the Drama of Writing. New York: State University of New York Press.
- Husên, F. (1994). Siwarên Êşê. Li Derveyî Welat: Weşanên Welat.
- Husên, F. (2010). Parîsabad. Stembol: Avesta.
- Husên, F. (2012). Barê Şevê. Stembol: Avesta.
- Husên, F. (2013). Evdo û Çend Bêhnîkên Şadiyê. Stembol: Avesta.
- Husên, F. (2014). Piçek jîyan Qetek Asîman. Stembol: Avesta.
- Husên, F. (2015). Amîdapad. Stembol: Avesta.
- Husên, F. (2015). Heftiyêke Dirêj Li Amedê. İstanbul: Avesta.
- Husên, F. (2015). Qûma Mezopotamya. (F. Husên, Wer.) İstanbul: Ayrıntı.
- Husên, F. (2021). Nameyek Ji Bavê Min Re. İstanbul: Avesta.
- Karataş, A. (2019). Diyasporada Kürt Gençliğinin Gelişimi. Ankara: Töz.
- Khayati, K. (2008). From Victim Diaspora To Transborder Citizenship? Diaspora formation and transnational relations among Kurds in France and Sweden. Linköping University: Linköping.

- Kılıç, D. (2009). Bahman Ghobadi'nin Filmlerinde Kürt Kimliği ve Kültürünün Temsili. M. Arslan Di nav, Kürt Sineması; Yurtsuzluk Ölüm ve Sınır (s. 137-174). İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Mishra, V. (2007). *The Literature of the Indian Diaspora Theorizing the Diasporic Imaginary*. London and New York: Routledge.
- Palo, M. E. (2022), *Civîna Nemiran Mela Ehmedê Palo*, Amd. Yıldırımçakar M. , Rêzan P. , Başçı, V. , Aykaç Y, İstanbul: Nûbihar
- Pariltı, A., & Galip, Ö. (2010). *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*. (M. Tanaydın, Amd.) İstanbul: Sel.
- Safran, W. (1991). "Diaspora in modern societies: myths of homeland and return",. *Diaspora*, 1(1), 83-99.
- Said, E. (2006). *Kış Ruhü*. (T. Birkan, Wer.) İstanbul: Metis.
- Said, E. (2009). *Kültür ve Direniş David Barsamian'la Konuşmalar*. (O. Akinay, Wer.) İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Said, E. W. (2004). *Relections on Exile and Other Essays*. Cambridge, Massachusetts: Harvard University Press.
- Said, E. W. (2014). *Yersiz Yurtsuz*. (A. Üçer, Wer.) İstanbul: Metis.
- Said, E. W. (2016). *Kültür ve Emperyalizm*. (N. Alpay, Wer.) İstanbul: Hill.
- Sapiro, G. (2019). *Edebiyat Sosyolojisi*. (E. C. Gürcan, Wer.) Ankara: Doğu Batı.
- Sazzad, R. (2017). *Edward Said' Concept of Exile Identity and Cultural Migration in The Middle East*. London û New York: I.B. Tauris.
- Sheffer, G. (2003). *Diaspora Politics at Home Abroad*. New York: Cambridge University Press.
- Tejel, J. (2009). *Syria's Kurds History, Politics and Society*. (E. Welle, & J. Welle, Wer.) New York: Routledge.
- Volkova, B. (2021). *Forms of Exile in Jewish Literature and Thought Twentieth-Century Central Europe and Migration to America*. Boston: Academic Studies Press.
- Wahlbeck, Ö. (2002). The concept of diaspora as an analytical tool in the study of refugee communities. *Journal of Ethnic and Migration Studies*, 28(2), 221-238. doi:<https://doi.org/10.1080/13691830220124305>
- Wahlbeck, Ö. R. (2019). *The Future of the Kurdish Diaspora*. Di nav M. M. Gunter, Routledge (s. 413-424). London: Taylor & Francis Group. doi:<https://doi.org/10.4324/9781315627427>
- Yekdeş, Ö. F. (2015-2016). *Sirgûnek Di Nav(ber)a Rabirdû û Niha De. Wêje û Rexne*, 183-201.
- Yeşilmen, D. (2014). *Temaya Sirgûnê Di Çar Romanên Kurdî (Kurmançî) De*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.